# BULTENA HDP'ê YA ÇANDINIYÊ

**2021/Hejmar:4**




Ofêsa Mehsûlên Axê (TMO) 5 hezar ton rûnê gulberojê yê îthal kiribû diparizîne û 5 lîtreya wî bi 60 lîrayan difiroşe. Her çiqas 5 lîtreya rûnê gulberojê di navbera 62-72 lîrayan be jî , bi firotana rûnê, TMO tu fêdeyekê ji hilberîneran nake. TMO hilberên îthal derdixe bazarê, ev yek rewşa çandiniya Tirkiyeyê bi aşkerayî dide ber çavan. Li cihê ku pêwîst e TMO hilberên paleyan bikire û sazûmaniya xwe ji bo pesartina hilberîneran bide xebitandin, mixabin ew firotana hilberên îthalkirî wekî mizgîniyek peşkeş dike.

- Di çar mehên pêşî yên sala 2021'ê de, ji sedî 12 zem hat ser bihayê êmê alajan ku ji bo ajaldaran lêçûnek sereke ye. Konseya Neteweyî ya Şîr (USK) bi tenê ji sedî 3,5 zem anî ser kirîna şîr û fiyeta lîtreya şîrê xav ji 2,80 lîreyan derket 2,90 lîreyan.

- Wezareta Çandiniyê û Daristanan, li navçeya Havzaya Samsûnê, 1350 kg toximên ji xwederên biyanî li paleyan belav kir. Hikûmeta AKP'ê van toximên biyanî wekî pesartina toximên "xwecih û neteweyî " nîşan dide.

***Guleyek = 2 kîlo kartol, 2 kîlo pîvaz***

Wekî tê zanîn di sala 2019’an de îsot û firingî wekî ‘terorîst’ hatibûn îlan kirin û Serokkomar Erdogan li qadên mîtîngan wiha gotibû “Niha xwe bi îsot û firingiyan digirin, dibêjin qey wê bi qalkirina îsot û firingiyan ji gelan ray bistînîn. Ez ji vê derê ji hilberîneran dipirsim: gelo hûn dizanin ku fiyeta guleyek bi çi qasî ye?”. Di 10’ê Nîsana 2021’ê de, Serokkomar Erdogan vê sosret û şermê wekî mizgîniyekê diyar kir ku wê milyonek û 200 hezar ton kartol, 250 hezar ton pîvaz û 750 hezaz ton çeltûk ên di destê hilberîneran de mane wê ji aliyê TMO’yê ve bên standin û bê pere li gel bên belav kirin. Çapemeniya alîgir bi rojan propagandaya vê şermê kir. Lê ligel vê propagandaya şermdêr bi tenê 300 hezar ton kartol, 50 hezar ton pîvaz û 40 hezar ton çeltûk hatine belav kirin. TMO tona kartolê bi 90 qurişan û tona pîvazê bi 85 qurişan ji hilberîneran stand û bi tevayî ji bo kartolan bi tevahî 27 milyon lîre û ji bo pîvazan bi tevahî 4 milyon û 250 hezar pere dane paleyan.

## Şîrketên di bin sîwana Wezereta Çandiniyê û Daristanan de zirar dikin, ev yek dide nîşandan ku hikûmat nikare warê çandiniyê bi rê ve bibe.

- Yek ji peydekerên pembû yên herî mezin, Koperatîfa Çandinî û Firotana Pembû ya Koçarliyê ya ku li Navçeya Koçarli ya Aydinê fealîyet dike, di vê sala dawî de 18 milyon û 205 hezar lîre zirar kiriye.
- Ajaldariya TAREKS'ê ya yek ji pardarê Koperatîfên Krêdiyan a Çandiniyê ye, raporek pêşkeşî Dezgeha Piyaseya Serbest kir û da zanîn ku di sala 2020’an de ew ji ber nexweşiyan 2322 ajalên make serjê kirin. Ji vê sedemê TAREKS 11 miyon lîre zirar kir. Wekî ku tu tiştek nebûbe, rêveberên TAREKS’ê hesabê vê zirarê nedan û di ser de 3527 ajalên make îthal kirin.


**Rêjeya guherîna Endeksa Fiyetên Lêçûnê ya Çandiniyê (%), Sibat 2021**




Çavkanî: TUIK

- Endeksa Fiyeta Lêçûnan a Çandiniyê di meha Sibatê ya 2021'ê de li gorî meha pêşî ji sedî 1,40 li gorî meha Berfenbarê ya 2020'an ji sedî 3,39 û li gorî meha Sibatê ya 2020'an ji sedî 19,60 zêde bûye.

**Li gorî binbeşan, Rêjeya guherîna salane ya Endeksa Fiyeta Lêçûnan a Çandiniyê (%), Sibat 2021**





Çavkanî; TUIK

- Di warê lêçûnên çandiniyê de beşa ku herî zêde zem lê hat berdardêrên gubre û axê bûn; ji sedî 36,21 zêde bû. Di pey re beşa avahiyên cotgehan tê; lêçûnên vê beşê ji sedî 29,42 zêde bûn. Bi zêdebûna ji sedî 29, sêyemîn beşa ku fiyetên wan herî pir zêde bûn jî bi mesrefên sereguhiyên maşînan e.

**Li gorî grûbên serekî û binbeşan rêjeya veguherîna Endeksa Fiyetên Lêçûnê ya Çandiniyê (%), Sibat 2021**


| Sereke û komên jêr | | Rêjeya veguherînê ya li gorî meha pêşî (%) | Rêjeya veguherînê ya li gorî meha Berfanbarê ya sala çûyî (%) | Rêjeya veguherînê ya li gorî heman meha sala çûyî (%) | Li gorî navînîyên donzdeh mehan rêjeyê biguherînin |
|---|---|---|---|---|---|
| Endeksa Fiyetên Lêçûnê ya Çandiniyê | **197,45** | **1,40** | **3,39** | **19,60** | **11,57** |
| Materyalên Toxim û Çandiniyê | **193,70** | **1,41** | **3,12** | **19,16** | **11,09** |
| Enerjî û Don | 165,89 | 1,45 | 1,53 | 2,59 | 4,31 |
| Berdardêrên Gubre û Axê | 197,10 | 0,14 | 2,13 | 7,43 | 0,69 |
| Dermanên Çandiniyê | 202,50 | 5,96 | 11,38 | 36,21 | 9,44 |
| Destheqên Beytaran | 155,50 | 1,84 | 2,99 | 10,32 | 1,45 |
| Êmê Ajalan | 129,73 | 3,33 | 4,91 | 9,02 | -0,57 |
| Mesrefên Sereguhiyên Maşînan | 199,31 | 1,57 | 2,74 | 24,63 | 16,51 |
| Mesrefên Sereguhiyên Avahiyan | 242,50 | -2,27 | -4,01 | 29,00 | 23,05 |
| Mal û Xizmetên Din | 212,38 | 1,83 | 5,58 | 26,19 | 11,12 |
| | 182,54 | 0,43 | 3,19 | 13,75 | 11,06 |
| Mal û xizmetên ku li veberanîna çandiniyê tevkarî dikin | **223,50** | **1,30** | **5,05** | **22,33** | **14,62** |
| Avahiyên Cotgehan | 210,41 | 1,97 | 4,33 | 19,56 | 13,89 |
| Malzemeyên Din | 262,09 | -0,24 | 6,79 | 29,42 | 16,48 |

Çavkanî; TUIK




Çavkanî: Rojnameya Dunya

- Li gorî encama anketa Rojnameya Dunyayê, ya ku bi 300 karmendan re hatibû kirin, di warê aboriyê de pirsgirêka herî girîng û sereke maliyeta lêçûnan e.
- Di mehên havînê yên sala 2020'an de, li Anatoliya Rojhilat û li Anatoliya Başûrê Rojhilat, ji ber ku DEDAŞ elektrîkên wan birand, bi sedan cotkar û pale li zerareke mezin ketin. Desthilata AKP'ê ya ku di pandemiyê de tu piştgiriyek neda cotkaran plan dike ku pîgariya bi qasî 3 milyar lîre li şîrketên ku elektrîka cotkaran dibirin bike. Berdêla vê pîgariya ku li şîrketên elektrîkê tê kirin wê li fatoreyên elektrîkê zêde bibe û wê dîsa ji berîka cotkaran derkeve. Desthilata AKP'ê ji sala 2018'an heta niha pîgariyê li şîrketên peydekerên elektrîkê dike; di sala 2018'an de bi qasî 1,4 milyar lîre, di sala 2019'an de 2 milyar lîre û di sala 2020'an de jî 2,2 milyar lîre li van şîrketan hatiye belavkirin.




Çavkanî; Serkariya Giştî ya Meteorolojiyê

- Li Amed, Mêrdîn, Sêrt, Şirnex, Êlih û li Rihayê, kêmbarîn û ziwayî bandorek xerab li piraniya hilberîneran kir û keda wan berhewa bû. Tê texmînkirin ku wê li herêmê adaniya xurekên wekî genim, ceh, nîsk û nokan ji sedî 80 bikeve. Bi tenê li Rihayê nêzî 35 hezar pale yên li ser bi tevayî 3,5 milyon berecot erdê çandiniyê dixebitin, wê ji kêmbarîn û ziwayiyê tesîrek neyînî bigirin. TUIK dibêje ku wê di sala 2021'ê de rekolteya genim bes ji sedî 5 kêm bibe, lêbelê Odeyên Çandiyaran ên li herêmê dibêjin ku rekoltaya genim wê herî kêm ji sedî 15 bikeve. Heke bi dahatek rasterast li cotkarên ku ji ber ziwayiyê li zirarê ketine neyê kirin, mixabin wê piraniya wan nikaribin erdên xwe yên çandiniyê cot bikin.

## Bûyera Mehê:

## 82 Pez Hatin Binçavkirin !



**Wêne:** Wêneyek temsîlî / mansetebak.com

Li gundê Karataşê yê girêdayî navçeya Serêkaniya Rihayê, 82 pezên ku li ser mêrgên girêdayî Serkariya Giştî ya Karsaziyên Çandiniyê (TIGEM) diçêriyan ji aliyê leşkeran û TIGEM'ê ve hatin binçavkirin. Mehmet Karataş ê ku du pezên wî jî hatibûn binçav kirin, ji ber ku pezekî wî avis xwest ku wan werbigire, lê peywirdarên TIGEM'ê ji bo ku pezên wî radest bikin jê 500 lîre xwestin. Mehmet Karataş 500 lîre da û pezên xwe yên avis wergirt, lê pezên din hîn jî di bin çavan de dimînin. Parlamentera me ya Rihayê Ayşe Surucu û parlamenterê me yê Mêrsînê Ridvan Turan vê mijara trajîkomîk anîn rojeva meclisê û ji bo ku Wezîrê Çandiniyê û Daristanan bibersivîne pirsname dan meclisê. Lê wezaretê der barê vê mijarê de hîn tu bersivek nedaye.

**Hilberên Çandiniyê yên Demsalî, Meha Nîsanê**




Çavkanî: Komel a Bugday

- **Xuyang 2: Fiyetên Çend Hilberên Demsalî**

| Hilber, Kg | Li Zeviyên Mêrsîn'ê | Li Hala Mêrsîn'ê | Mêrsîn Li Ser Dezgeh | Li Hala Stenbol'ê | Stenbol Li Ser Dezgeh |
|---|---|---|---|---|---|
| **Pirteqal** | 4 Lîre | 5 Lîre | 7 Lîre | 9 Lîre | 11 Lîre |
| **Leymûn** | 2,5 Lîre | 3,5 Lîre | 4 ,5 Lîre | 6 Lîre | 8 Lîre |
| **Încas** | 8 Lîre | 10 Lîre | 15 Lîre | 16 Lîre | 20 Lîre |
| **Baqle** | 2 Lîre | 3 Lîre | 4-5 Lîre | 4-10 Lîre | 12-15 Lîre |
| **Artîşok(heb)** | 2-4 Lîre | 3-5 Lîre | 5-7 Lîre | 4-5 Lîre | 6-8 Lîre |
| **Sindî** | 1-2 Lîre | 2-3 Lîre | 4-5 Lîre | 5-6Lîre | 6-8 Lîre |
| **Polik** | 1-3 Lîre | 3-5 Lîre | 2-4 Lîre | 4-5 Lîre | 5-7 Lîre |
| **Îspenaq** | 1- 2 Lîre | 2-3 Lîre | 3-4 Lîre | 2-3 Lîre | 4-5 Lîre |
| **Pirase** | 25-75 kuruş | 75 kuruş- 1,5 | 2-3 Lîre | 1,5- 2,5 Lîre | 4-5 Lîre |

| | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|
| | | Lîre | | | |
| **Pîvaza Şîn** | 1-3 Lîre | 2- 4TL | 3-5 Lîre | 4-5 Lîre | 5-6 Lîre |
| **Kelema Brûkselê** | 4-9 Lîre | 5- 10 Lîre | 6- 11 Lîre | 5-7 Lîre | 6-8 Lîre |

Çavkanî: Hala Mezin ya Mêrsîn'ê

*Not: Fiyetên di xuyangê de hatine nivîsandin ên herî kêm in, dibe ku di van fiyetan de cih bi cih cudahî çêbibin.*

**TENÊTIYA FIRINGIYAN!**



Her çiqas firingî, ya ku ji xwemaliya Amerîkaya Başûr û Navîn e, wekî cureyek sebzeyan bê zanîn jî ew riwekek malbata fêkiyan e. Li welatê me toximê firingiyan herî peşî di despêka sedsala 19'emîn de hatine avêtin, ji wê demê heta niha firingî ji ser sifreyên me kêm nabin û ew li Anatoliya û Mezopotamyayê bûye yek ji hilberên misoger yên çanda xwarinê. Ji çêkirina salçeyê bigire heta hişkkirinê, firingî di çanda me ya xwarinê de di çêkirina gelek xwarinan de tê bikaranîn û ew ji hêla vîtamîn û mîneralan ve dewlemend e. Her wiha firingî wekî selete bi xavîtî û bi tena serê xwe jî li ser sifreyan cihê xwe digire.

Di demsala havînê de ji ber ku hilberîna firingiyan zêde dibe fiyeta wî jî kêm dibe. Di demsalên din de firingî li serayan tên gihaştin û fiyeta wê zêde dibe. Lê ev yek tu car nehatibû dîtin ku firingî bi heban bê firotin. Lêbelê, wekî di dîmenê li jor jî xuya dibe, li Tirkiyeyê ya qaşo welatekî çandiniyê ye êdî firingî bi heban tê firotin. Ev weziyeta trajîkomîk bi aşkereyî dide ber çavan ku qeyrana aboriyê çiqas kûr bûye. Gelo çima firingî bi heban tên firotan? Çimkî fiyeta wê gelek zêde ye. Hêza gel a kirînê ew qas ketiye ku firingî bi heban tên firotin. Êdî hemû kes dizanin ku ji ber ku maliyet û lêçûnên gihaştina firingiyan gelek zêde dibe fiyata firingiyan jî biha dibe. Zêdebûna maliyet û lêçûnan encama berbendbûna derve ye. Ev welat di hilberîna çandiniyê de ew qas berbendî şîrketên biyanî bûye ku êdî firingî bi tena sere xwe dimînin û bi heban tên firotin.

Gelo bi tenê firingiyek bi kêrî çi tê? Derfet ew qas hatine tengkirin ku ji bilî zûlandinê tiştek nayê bîra mirov. Lê dibe ku  minaqeşeya “meleme bi firingî an bê firingî tê çêkirin?” nêzikatiyek din li minaqeşeya “meleme bi pîvaz an bê pîvaz tê çêkirin?” bîne. Bêguman melemeya bêfiringî ne tu meleme ye. Yên ku vê şêweya hilberînê disepînin û firingiyê bi tena serê xwe dihêlin bila ji vê rewşê şerm û fedî bikin!

HDP